

Bemfolapre pênûsa-derzî çawa tê bikaranîn



Ji we re Bemfola hat reçetekirin û ev rûpela
telîmatnameyê dê nîşanî we bide ka hûnê pênûsê
çawa bi kar bînin.

Bemfola 75 IU/0.125 ml

Bemfola 150 IU/0.25 ml

Bemfola 225 IU/0.375 ml

Bemfola 300 IU/0.50 ml

Bemfola 450 IU/0.75 ml

Solusyona derzîkirinê ya nav pênûsa-derzî.



bemfola
follitropin alfa

Tiştên ku


bên bîranîn:

Destên xwe bişon

Derziyê her roj heman saetê li xwe bidin

Pênûsa xwe 5–10 deqîqe beriya bikaranînê ji sarincê derxînin

Beşên cuda yên pênûsa we



E Derzî

F Qapaxa hundir a derziyê

G Qapaxa derve ya derziyê

A Dozaj


B Bişkovka dozajê

C Şîşika aktivasyonê

D Kartûşa bi îlac


Amadekirina derziya xwe

Etîkêtê ji ser derziya enjeksiyonê rakin. Pênûsê her wekî tê nîşandan bigirin da ku bişkovka dozajê neyê paldan. Derziyê pêve bikin bi rêya êxistina nav cihê wê.




Qapaxa derve ya derziyê derxin. Wê ji bo careke din veşêrin.

Piştî derzîkirinê ew ê ji we re lazîm bike. Qapaxa hundir a derziyê derxin.




Pênûsê wisa bigirin ku berê derziya wê bikeve jor.¹

Bişkovka dozajê pal bidin ta ku disekine. Şîşika aktîvasyonê winda dibe û divê hinek lîkîd jê bavêje derve – ev normal e.² Eger lîkîd jê neavêje derve, pênûsê bi kar neynin, yeke nû hilgirin.



Eyarkirina dozê

Bişkovka dozajê bizivîrinin ta ku doza ji we re hatiye reçetekirin were ser xeta ekranê. Pênûs niha amade ye ji bo derzîkirinê.



Derzîkirina li xwe

Zûka lîkîdê (wek edetî nav zîkê xwe) li gor telîmatên bijîşk an jî hemşîreya xwe derzî bikin. Bi awayekî nerm çermê li cihê derzîkirinê bigivêşin û derziyê tê re bikin.



Hişyarî! Gava ku hûn derziyê dixinê bişkovka dozajê pal nedin!

Bişkovka dozajê hêdîka û domdar paldin ta ku ew disekine û şîşika dozê winda dibe.


Derziyê zûka dernexînin. Beriya derxistinê 5 saniyan bisekinin.

Piştî derzîkirinê: Qapaxa derve ya derziyê biguherin û derziya bikarhatî bixin nav tîşteke girtî (wek şûşe an jî qotiya şîr)û wê bavêjin nav zibilên malê.

Ekîpmanên mayî yê bikarhatî jî bavêjin nav zibilên malê.



Nav sarincê veşêrin (2°C – 8°C). Nekin cemed. Ji bo 90 rojan dikare ji sarincê bê derxistin û di germahiya odê de bê veşartin (zêdetirîn 25°C).



| Bemfola 75 IU 0,125 ml | Bemfola 150 IU 0,25 ml | Bemfola 225 IU 0,375 ml | Bemfola 300 IU 0,5 ml | Bemfola 450 IU 0,75 ml |
|------------------------------|------------------------------|-------------------------------|-----------------------------|------------------------------|
| 75 IU | 150 IU | 225 IU | 300 IU | 450 IU |
| 62,5 IU | 137,5 IU | 212,5 IU | 287,5 IU | 425 IU |
| 50 IU | 125 IU | 200 IU | 275 IU | 412,5 IU |
| 37,5 IU | 112,5 IU | 187,5 IU | 262,5 IU | 400 IU |
| | 100 IU | 175 IU | 250 IU | 375 IU |
| | 87,5 IU | 162,5 IU | 237,5 IU | 350 IU |
| | 75 IU | 150 IU | 225 IU | 337,5 IU |
| | | | | 325 IU |
| | | | | 300 IU |

Agahiyên zêdetir derbarê vê ilacê li vê navnişanê peyde dibe <http://www.ema.europa.eu>

Agahiyên zêdetir ên nişandari li vê navnişanê peyde dibin www.youtube.com

Ji bo welatên Bakurî jî, agahiyên zêdetir ên berhemê li vê navnişanê peyde dibin:

– Swêd: www.fass.se

– Finland: www.laakeinfo.fi

– Danîmarka: www.ema.europa.eu

– Norwêc: www.felleskatalogen.no

Peywirdarê Karê Bazarkirinê û Hilberiner:

Gedeon Richter Plc.

Gyömrői út 19-21.

1103 Búdapeşt

Macaristan